Reservekirin û deyn ji pirtûkxaneyên din

Tu karî bikevî dorê ji bo pirtûkek ku li derve ye. Ger tu pirtûkek bixwazî û ew pirtûk li gel me tune be, em karin cehdbikin ku ew pirtûk ji pirtûkxaneyekê din bînin. Kengî pirtûk gihîşte me, emê name yan e-mailek bo te bişînin îca tu karî bê û wê pirtûkê bi xercekê kêm deynbikî.

Ger daxwaza te taybetî hebe ji bo pirtûkên hin bêtir ji bo zimanek, bêje ji me re. Em karin hin bêtir pirtûka bi vê zimanê binîn. Ev pirtûkana li qata 4 a, li refê "flerspråkshylla" wê bê danîn, û wek pirtûkên din bê pere tên deynkirin. Ev pirtûkana li dor 4 meha (hîva) wê li vir bê sekinandin paşê vegerin cîyê xwe berê.

Komputêrên pirtûkxanê Bikaranîna komputêrên pirtûkxanê bê pere ye. Lê divê tu nîzamî bî. Malperên porr (sex) û rasîstî (nijadperestî) ne edetî ye, qedexe ye.

Tu wisa li pirtûkxaneyê Mimers Hus peyda bikî

Pirtûkxane 3 qat in. Li her qatê pirtûk û media bi zimanên cure-cure hene.

Li qata 2, li qata entré, van pêyda dikî:

- Pirtûkên nuh
- Rojname û kovar
- Mûzîk
- Fîlmên vîdeo bo kirêkirin
- Pirtûk bi swedîyek hêsan
- Pirtûkên guhdarîkirinê (deng)
- Pirtûken zarok û ciwana
- CD-rom bo zaroka

Li vê qatê locayên xwendin û nivîsandinê hene.

Li qata navînê, li qata 3, van pêyda dikî:

- Pirtûkên ku li ser mijarek hatîye nivîsandin, evana li gor mijarê hatîye bi rêzkirin. Pêşî pirtûkên bi zimanê swedî, paşê eynî li ser wê mijarê bi zimanên din.
- Kursên swedî û ferheng

Li vê qatê salonek komputêrê, 2 hew ode komika û 1 ode xwendinê hene.

On Floor 4 – the top floor you will find

- Qisma Xanî û Mal. Li vir pirtûkên xwarinê, pirtûkên zanaatê, bax û bexçe û hwd pêyda dibin.
- Pirtûkên edebî, roman, çîrok, helbest, drama û hwd bi zimanê swedî
- Refê gellek zimana- "flerspråkshyllan" , bi pirtûkên edebî bi zimanên cure-cure
- Balkona medîa ji bo ciwana
- Odeyê mal çêkirinê – "hembygdsrummet" bi pirtûkên ku li ser Kungälv, Göteborg û Bohuslän hatîye nivîsandin.

Wek alîkarî ême yek rêberê dijital- digital guide heye, ev rêber cîyê hemû pirtûka nîşandide. Rêber bi gellek zimana ye. Tu vî rêberê li komputêrê pirtûkxanê û li malpera me da pêyda dikî

Bêtir înformasyon derbarê pirtûkxaneya bajarê di malpera me de heye: www.kungälv.se/bibliotek

Em karkerên pirtûkxanê bi keyfxweşî alîkarîya te dikin!

Bi xêr
hatin Pirtûkxanê

KURMANDJI

Kungälvs Stadsbibliotek

KUNGÄLVS KOMMUN

BI XÊR hatin Pirtûkxanê

Nuha te qerta xwe ya bi deynkirinê girtîyî. Em hêvî dikin ku tu wê bi keyf karbînî. Tu bi vê qertê karî li Kungälv, Kode, Kärna, Marstrand, Diseröd (Romelanda) û Ytterby deyn bikî.

Tu li vê derê karî van tiştana bê pere deyn bikî:

- Pirtûken zaroka bi gellek zimana
- Ferheng
- Kursên swedî
- Pirtûkên swedî bi zimanek hêsan
- CD û videoyên muzîkê
- CD-rom bo zarok û mezina
- Pirtûkên ku li ser kaset yan li ser CD hatîye qeydkirin
- Hejmarên kevn yên rojname û kovara

Pesinandina şertên deyn

Ez şert û şirûtên pirtûkxanê dizanim û wan qebûldikim:

Paşnav / Efternamn:	
Nav / Förnamn:	
Çêbûn / Personnummer:	
Navnîşan / Gatuadress:	
Hejmarpost / Postnr:	Cî / Ort:
Telefon:	Telefona bêrîk / Mobiltel:
E-mail:	
Tarîx / Datum:	
Îmze/Îmzeyê dêûbav / Underskrift/Målsmans underskrift	

Wekî din tu li pirtûkxanê karî:

- Bi şikil şikil zimana rojname û kovaran bixwînî
- Internet yan programên nivîsandinê bi kar bînî. Dor veqetandina komputêrê ya li internet yan jî li pirtûkxanê çêdibe.
- Temrînî bikî him bo swedî him jî bo pêşbirkî erebeajotinê di qulikên (locayên) xwendin û nivîsandinê de.
- Fîlmên video û DVD kirê bikî.

Qertê pirtûkxanê giranbuha ye: Divê meriv di ser 18 re be bo girtina qertê pirtûkxanê. Ewên ku hin ne 18 ne û dixwazin qertê derxînin, divê dêûbavê wan imze xwe bidin. Qerta yekem bê pere ye. Ger ev qert wenda bibe meriv kare, bi perekî kêm yekî nuh derxîne, lê divê huwîye (kimlik-şahade) meriv bê nîşandan.

Koda qertê – Pinkod Qerta deynkirinê karê bi kodek bê girêdan. Ev kod ji bo ketina Internetê tê bikaranîn. Bi vê yekê tu karî wextê deynkirinê dirêj bikî, karî bibînî ka te çi deyn kirîyî, karî pirtûkan û mediayên din reserve bikî, wext bo komputêrên pirtûkxanê veqetînî.

Wextê deynkirinê Wextê deynkirin normal 4 hefte ye, li kaxizê (kvitto) binêre. Berpirsiyar bo tiştên ku te deyn kiriyî, tu yî. Ger ev tişt winda bibin yan zirarê bibînin divê tu heqê wan bidî.

Malûmat di derbarê informasyona şexsî de: Tu kengî ji bo qerta deynkirinê, ya xwe yan ya zarokê xwe îmze xwe didî; hingê li gor zagona (qanûna) şexsî qebûldikî ku nav û hwd informasyon di derhaqê te de jî karibe bê qeydkirin. Lê belê ev informasyon tenê ji bo pirtûkxanê ye, ne ji bo derên din. Ew pirtûk yan media ku tu deyn dikî yan dixwazî deyn bikî, li gel komputêrê pirtûkxanê tê qeydkirin. Ev informasyon veşartî ne, kesên din nikaribin bizanbin te çi deyn kiriyî. Te kengî deyn bi paşte anî, wekî din jî deyn li ser tune bin ev informasyon ji komputêrê tê derxistin. Tu kengî bixwazî karî bizanbî ka çi li ser navê te hatîye qeydkirin, bes divê tu huwîya xwe nîşanbidî.

Xwe bi xwe servîskirin Li pirtûkxanê hacet hene ku tu bi xwe karîbî ji bo deynkirin û vegerandina pirtûka bikarbinî. Berpirsiyarî (mesûliyet) li ser te dikeve. Personalên (karkerên) pirtûkxanê karin alîkarîya te bikin ji bo deynkirin û vegerandina CD, kaset (têyb), video û rojname û pirtûkên derengmayî an reservekirinê.

Deynên derengmayî Tu deynê xwe di wext de venegerînî emê xercekî bigrin. Tu hin jî dereng bixinî emê nameyên teblîxê bo te bişînin. Ger deyn hin jî nehatibe vegerandin emê xeqê deyn, xercê derengmayînî û mesrefên din ji te bixwazin. Ger tu van nedî, tu êdî nikaribî tiştên din deynbikî û babet (mesele) jî diçe îcra.